Fêrbîn u Fêrkirin ya Zimanê

Heker te divêt hindek têbînîa da zimana Inglîzî (yan Kurdî yan Frensî yan Almanî) fêr bî – yan fêr bikî – bila her heyv vê nivîsandinê bixwîne. Her heyv ez dê êk yan dû pêşnîara nivîsim u paşî tu dişêî bi kar bînî li fêrbîna xu yan li dersêt xu heker tu mamosta î.

Peyva ji ber bike. Wextê tu zimanekê bîanî dixwînî, pêtivî ye tu gelek peyva fêr bî. Çêtir e heker tu fêr dibî li têgehiştinekê li ser wê axiftinê u têgehandinê:

(1) Peyvêt wek êk u dû hilbijêre (bu numune, *fêqî – sêv, pirteqal, zebeş, muz, tirî*).
(2) Peyvêt nî li ser kaẅezêt biçîk yan li lîste binvîse. Ewan peyve ji ber bike.
(3) Pêyvêt kirîarî (firman / fi'el) zêde bike ku jêk tên (bu numune, *kirrîn, bikirre; firutin, bifiruşe; xwarin, bixu; şîştin, bişu; spî kirin, spî ke; înan, bîne; dan, bide; bi dilê [min] e; bi dilê [min] nîne*). Ewan jî ji ber bike.
(4) Ëemî peyva bi kar bîne da rista bi mane bêjî (bu numune, *Min hindek sêv kirrîn. Wê tirî şîşt. Wan pirteqal spî kirin. Ez dê bu te hindek muza înim. Zebeş bi dilê me ye*).

kî	çi	çawa
ez / min	fêqî	kirrîn, bikirre
tu / te	sêv	firutin, bifiruşe
ew / wî	pirteqal	xwarin, bixu
ew / wê	zebeş	şîştin, bişu
em / me	muz	spî kirin, spî ke
hîn / we	tirî	înan, bîne
ew / wan		dan, bide
		bi dilê [min] e; bi dilê [min] nîne

Bixwîne. Çîroka, nama, îmêla, micela, rojnama, webseyta, Incîlê u filan bixwîne da peyvêt xu qayim bikî u zêde bikî. Me'nêt peyva ji têgehandina wan fêr bibe jiberî tu ferhengekê seẅ kî. Hindek webseytêt Inglîzî eve ne:

Focus on the Family magazine - **http://www.focusonthefamily.com/**
Reader's Digest magazine - **http://www.rd.com/**
Time Magazine - **http://www.time.com/time/**
Fox news - **http://www.foxnews.com/**

Tekstekê bixwîne u guhê xu bide, bu numune Incîlê - **net.bible.org/bible.php?book=Mat&chapter=1**.

Binvîse. Peyvêt nî binvîse wextê tu guhê hevalêt xu dikî demê tu li gel wan diaxivî yan demê hevalêt te li gel êk u dû diaxivin. Rojnamekê biçîk li gel êkê Emrîkî binvîse da ew nivîsandinêt te dirist bikit.

Ferhengê bi kar bîne. Ferhenga Behdînî-Inglîzî anleyn bi kar bîne - **www.dcklci.com/dictionary** yan ferhenga Inglîzî-Inglîzî bi kar bîne - **http://nhd.heinle.com/home.aspx**.
Yan ferhengekê (kitêbekê) bi kar bîne.

© 2007 by Şirîn

© 2007 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.